



Kantona Zurichê
Midûriyeta Perwerdehiyê
nivisgeha dibistana seretayî
pêşxistina taybetî
sektora perwerdeya navçandî

Têkelf: Walchestrass 21, 8090 Zürich
Telefon 043 259 53 61, ikp@vsa.zh.ch
8ê Adarê, 2022
1/3

Nû hatina li gel zarokên di temenê dibistanê de

Hemî zarok û ciwanên di temenê dibistanê de ku nû têne şaredariya Zurichê xwedî maf û erka çûna dibistanê ne. Ev ji destpêka rûniştina wan û bêyî ku bi rewşa rûniştina wan giriday be. zarokxane (Kindergarten) jî beşek ji dibistana mecbûrî ye.

Perwerdeya mecbûrî

Dibistana mecbûrî yazdeh salan dom dike, lê ji heta qedandine dibistana seretayî ne dirêjtire. Ev jî dikare li dibistanên taybet ên ku destûra wan ji kantonê heye, pêk were.

Zarokên ku temenê wan gihîştîye çar salî¹, pêwîsten ku di destpêka sala bê de biçin dibistanê û biçin zarokxane (Kindergarten). 31ê tîrmehê muhleta qeydkirinê ji bo rojbûnê ye. Li kantona Zurichê ciwanên ku temenê wan 16 saliya xwe derbas kirine ji dibistana mecbûrî tên efû kirin. Lêbelê, mafê wan heye ku ew sala xwendinê biqedînin.

Di dibistana seretayî ya giştî de bijartineke azad tune: zarok diçin dibistana ku lê dijîn. Zarok ji Daîreya dibistanê ya herêmî (lijneya dibistanê) li dibistanan tên bela kirin. Dê û bav azad in ku dibistanek taybet hilbijêrin. Ew bi xwe mesrefên dibistana taybet hildigirin.

Qeydkirina zarokan

Ger zarokek nû be şaredariya Zurichê, divê dê û bav tavilê wî li cem dezgeha dibistanê (lijneya dibistanê) qeyd bikin. Ev erk ji bo hemû zarok û ciwanên di temenê dibistanê de derbas dibe.

Dema ku malbat li kantona Zurichê dijî, dê û bav bi rêveberiya dibistanê re dikevin têkiliyê da ku li ser qeydkirina zarokê xwe nîqaş bikin û her pîrsek zelal bikin.

¹ Mînak
rojbûna di navbera ...

01.08.2019 û	31.07.2020	→	Qeydkirina sala xwendinê ya 2024/25
01.08.2020 û	31.07.2021	→	Qeydkirina sala xwendinê ya 2025/26



Navnîşanên rayedarên dibistanên herêmi li vir têne dîtin:

- li seranserê kantonê:
www.zh.ch/schulen
- li bajarê Zurichê:
https://www.stadt-zuerich.ch/ssd/de/index/volksschule/schulkreise_kreisschulbehoerden.html

Qeydkirina dibistanê

Lijneya dibistanê zarok tayînî dibistanê dike. Rêvebiriya dibistanê berpirsiyar e ku zarok ji bo pola dibistanê ya guncaw veqetîne. Bi qasî ku gengaz be, pola divê li gorî temenê zarokê têkildar be. Ger zarokek hindik an jî qet almanî biaxive, ji bilî dersên asayî, beşdarî dersên bi Almanî wekî zimanê duyemîn (DaZ) dibe. Mamosteyê pola birêkûpêk ji bo entegrekirin û xebatê bi mijara dersê piştgirî dide zarokê.

Li hin bajaran "Dersên Qebûlkirinê" hene". Zarok bi gelemperî herî zêde salek di van de dimînin. Zarok fêrî zimanê Almanî dibin û xwe ji bo derbasbûna dersa asayî amade dikin.

Amadekirina ji bo cîhana kar

Daîreya Şêwirmendiya Ciwanan û Kariyer şîret û zanyariyan pêşkêş dike bi taybetî ji bo dê û bavên koçber û biyanî têne armanc kirin. Pêşniyar bi navê «[Integras](#)».

Ji bo ciwanên biyanî yê ku di navbera 15 û 21 salî de koç dikin, dibistanên kar hilbijêrî „[Sala amadekariya kar ya ji bo ziman û entegrasyonê](#)“ taybet pêşkêş dikin. Di kursa vê salanê de ciwan di serî de almanî fêr dibin. Wekî din, ew zanyariyên ku ji bo ketina dibistana navîn an perwerdehiya pîşeyî hewce ne bi dest dixin.

Ofîsa dibistana navîn û perwerdehiya pîşeyî [Pêşniyarên pira](#) pêşkêş dikin. Van Kursê hanê dem pîrek dikin di navbera dibistana mecbûrî û perwerdehiya destpêkê de. Ew ji bo ciwanên ku piştî dibistana navîn devereke talîmê (Lehrstelle) nedîtine an jî ji bo wan hîn zû ye ku karekî hilbijêrin têne armanc kirin.



Zêdetir agahdarî ji bo dê û bavan

- Agahdarî ji bo dêûbavan li ser dibistana seretayî li kantona Zurichê, tevî zarokxanê
- Hînkirina Almanî wekî zimanê duyemîn
- Dersên dilxwazî bi zimanê zikmakî ne-almanî (zimanê yekem)
- Awireke giştî hemû astên sîstema perwerdeyê li kantona Zurichê
- Lîste li gel lînkê ji bo koçberan li ser entegrasyon, perwerde û Kar